

# Skotland: Di navbera otonomîya asîmetrîk û serxwebûnê de

## PROFÎL: NASNAMEYA WELÊT

### PROFÎL: NASNAMEYA WELÊT

**NIFÛS**  
5.550.000 (2024)

**RÛBER**  
78.782 km²

**PAYTEXT**  
Edînbûrg

**ZIMANÊN FERMÎ**  
Îngilîzî (96,8%)  
Skotî (1,9%) · Galîkî (1,3%)

**STATU**  
Herêma Xweser (1999)



Skotlanda ku di sala 1999an de piştî nêzîkî 300 salan ji nû ve bû xwedî parlamentoya xwe ya herêmî, îro bi modela xwe ya "devolution"ê û nîqaşên li ser serxwebûnê mîna keke giring û dînamîk a xwerêveberîyê ye. Welat bi rêya transferkirina erkan di warê baca dahatê, karûbarên hundir, perwerde, tenduristî û jîngehê de xweseriya xwe gihandî ye asteke bilind. Lê ji ber derketina Brîtanyayê ji Yekîtiya Ewrûpayê (Brexit) û redkirina referandûma duyemîn a serxwebûnê ji aliyê Dadgeha Bilind a Brîtanyayê ve, aloziya di navbera di navbera London û Edînbûrgê de ketiye qonaxeke nû. Nîqaşên li ser referandûmên de facto, pêşniyaza modela federalîzmê û hevkarîya navneteweyî yên bi herêmên din ên xwedî daxwazên otonomî û serxwebûnê re destnîşan dîkin ku doza serxwebûna Skotlandê rojeveke zindî û mayînde ya sedsala 21em e.

## JINÛVEDAMEZRANDINA PARLAMENTOYA SKOTLANDÊ

**Skotland piştî 300 salan, di sala 1999an de bi rêya pêvajoya devolutionê (transferkirina desthilatê) jinûve bû xwedî parlamentoya xwe ya herêmî û statuya xweserîyê xurt kir.**

## RÊYA BER BI STATÛYÊ VE: JI YEKITÎYÊ HETA DEVOLUTIONÊ

Dîroka siyasî ya Skotlandê, tecrûbeyeke taybet a parastina nasname û saziyên neteweyî ye. Mîrektîya Skotlandê di Serdema Navîn de xwedî hebûneke serbixwe bû û heta destpêka sedsala 18em serwerîya xwe domand. Dema Îngilistan pêl bi pêl ber bi bakur ve berfireh bû, piştî şerên dirêj Skotlandê têk bir û bi Peymana Yekitîyê ya 1707an re Qraliyeta Brîtanyaya Mezin hate damezrandin. Digel ku di sala 1801an de Parlamentoya Skotlandê bi temamî hate girtin û hemû erkên polîtîk ketin destê hukumeta Westminsterê ya li Londonê, Skotlandê pergala xwe ya hiqûqî, perwerde û dêra xwe ya presbîteryen parast û nasnameya xwe ya skotî winda nekir.

Daxwazên ji bo Home Rule (xwerêvebirinê) di sedsala 19em de geş bûn. Cara yekem di sala 1885an de Ofîsa Skotlandê û paşê di sala 1926an de Wezareta Dewletê ya ji bo Skotlandê hatin avakirin. Vedîtina petrolê li Deryaya Bakur di salên 1970yî de tevgera neteweperest a li welêt xurt kir. Partîya Netewperwer a Skotlandê (SNP) bi kampanyaya "Ev petrola Skotlandê ye", di hilbijartina 1974an de 11 wekîl qezenc kirin. Her çend enîya serwerîparêz di referandûma otonomîyê ya sala 1979an bi ser ket jî, ji ber beşdarîya kêma hilbijêran encamên referandûmê nehatin qebûl kirin. Di referandûma duyemîn a 1997an de 74% ê gel ji bo avakirina parlamentoya welêt got "Erê". Qanûna Skotlandê ya 1998an bingeha xweserîyê ava kir û di sala 1999an de Parlamentoya Skotlandê piştî 300 salan carek din li Edînbûrgê hate vekirin.

### Erkên Parlamentoya Skotlandê ev in:

- Perwerde, hindekarî û xizmetên civakî û tenduristî.
- Edalet, rêvebiriyên lokal û polêsên trafîkê.
- Çandinî, karê daristanan, masîgirî, jîngeh û tûrîzm.
- Kontrola qanûnî ya liser petrol û gaza ji peravên welêt tê derxistin..

### Erkên di destên hikumeta navendî de:

- Destûra bingeîn, polîtîkaya derve û berevanî (parastin).
- Ewlehîya civakî, qanûnên koçberîyê û îstîhdamê.
- Bazirganî, endustrî û çavkaniyên sereke yên enerjîyê yên stratejîk.

Modela devolutionê asîmetriyeke giring di navbera herêman Qraliyeta Yekbûyî de çêkir. Modela devolutionê asîmetriyeke giring di navbera herêman Qraliyeta Yekbûyî de çêkir. Ji ber ku maf û desthilatên dabeşkirî bo her herêmê ne di heman astê de ne û Îngilistan ji vê sîstemê bêpar hate hiştin. Wekî nimûne, Parlamentoya Skotlandê xwedî desthilateke fireh e û ji 129 wekîlan pêk tê ku ji 73 herêman tên hilbijartin; di heman demê de xelkê Skotlandê bi 57 wekîlan di Parlamentoya Brîtanyayê de jî tê temsîl kirin. Vê yekê di warê qanûnçêkirin û temsîliyetê de asîmetriyeke siyasî di navbera herêman de afirand.

### BREXIT Û DOZA SERXWEBÛNÊ

Piştî biryara Brexitê û redkirina referandûma duyemîn ji aliyê Dadgeha Bilind a Brîtanayê ve, hêza enîya serwebûnê xurtir bû. Piştigiriya ji bo serxwebûnê îro gihîştîye 52%.

## AZADIYA FÎNANSÎ: PÊŞKETINA ERKAN Û PERFORMANSA ABORÎYÊ

Di destpêka damezrandina xweseriyê de, desthilata aborîyêya Skotlandê sînordar bû. Hukumeta herêmî tenê dikaribû 12%ê baca li ser erdên xwe berhev bikira û di warê finansê de bi giranî girêdayî Westminsterê bû. Lê serkeftinên SNPê di hilbijartinên 2007 û 2011an de zextên li ser hukumeta navendî zêde kirin. Li ser pêşniyaza Komîsyona Smith ku piştî referandûma 2014an hatibû damezrandin, Qanûna Skotlandê ya 2016an hate pejirandin. Bi vê qanûnê re, kontrola tam a li ser baca dahatê (income tax) û erka tespîtkirina baca balafirgehan ket destê hukumeta herêmî; birêvebirina milkên behrê û projeyên enerjîya nûjenbar derbasî Skotlandê bûn û saziyên herêmî bûn xwedî statûyeke mayînde.

Ev geşedan li Skotlandê rê li ber avakirina aborîyeke bihêz vekirin. Îro Hilberîna Navmalî ya Ne-Safî (HNN-GDP) nêzîkî 205 milyar sterlînê (240 milyar euro) û HNNya serê kesekî gihîştîye derdora 37.500 sterlînê (44.000 euro). Budçeya herêmî 60 milyar sterlîn e û rêjeya bêkariyê 4.1% e. Bi vê encamê, Skotland di nava herêmên herî dewlemend ên Ewrûpayê de cîh digire. Bingeha vê hêza darayî li ser çavkaniyên petrol û gaza Deryaya Bakur, projeyên enerjîya nûjenbar, sektora finansê, tûrîzm û hinardekirina berhemên taybet (wekî wiskî) ava dibe. Ev performans a aborîyê bawerîya bi kapasîteya azadîya darayî ya welat a ji bo serxwebûnê hîn xurtir dike.

## PARASTINA ZIMAN: REWŞA ZIMANÊ GALÎKÎ

Tevî ku nasnameya siyasî û saziyên Skotlandê gelekî xurt in, rewşa zimanê qedîm ê welêt—galîkî (Gaelic)—ketiye bin xetereyê. Zimanê galîkî ku di sedsala 10em de li piranîya welêt dihar axaftin û di Serdema Navîn de zimanê Mîrektîya Albayê (Skotland) bû, piştî Peymana Yekitiyê ya 1707an û bi bandora Şoreşa Pîşesazîyê gihîşt asta tunebûnê.

Îngilîzî hêdî hêdî di nav saziyên fermî, elîtan û bajarên mezin de bû zimanê serdest. Di sedsala 20em de galîkî tenê di nav civakên zozan û giravan de zindî ma. Li gorî daneyên fermî yên 2011an, li Skotlandê tenê 57 hezar kes (1.1%) bi zimanê galîkî diaxivin, lê li welêt rêjeya Îngilîzîaxêvan % 96.8 e. Tevî ku galîkî parçeyek sembolîk ê nasnameya çandî ya Skotlandê ye, zimanê siyasî û rojane bi sedan salane Îngilîzî ye.

## TECRÛBEYA REFERANDÛMÊ Û MESELEYA HIQÛQÎ

Pêvajoya siyasî û tecrûbeya referandûmê ya Skotlandê, berî her tiştî li serrêzebûyerên girîng û dînamîkên siyasî yên çend salên dawî ava bûye. Di sala 2014an de bi Peymana Edînbûrgê biryareke fermî hate girtin û di 18ê Îlonê de referandûmek Dîrokî hat lidarxistin. Di dengdanê de 55.3%ê hîlbijêran ji serxwebûnê re gotin "Na" û 44.7%an jî gotin "Erê". Tevî ku alîgirên serxwebûnê encameke serkeftî bi dest nexistin jî, ev gav bû sedem ku eniya serwerîyê ji her demê xurtir bibe û mesele herdem di rojevê de bimîne.

Lê belê, guherîna herî mezin a piştî vê bûyerê, di sala 2016an de bi referandûma Brexitê re çêbû. Piraniya xelkê Skotlandê ji bo mayîna di nava Yekîtiya Ewrûpayê (YE) de dengên xwe bi kar anîn. Lê ji ber ku dengên giştî yên Îngilistanê encamê dîyar kirin, tevahiya Brîtanyayê ji YEê derket. Ev rewş bû sedema guherîneke kûr di nêrîna siyasî de û Partiya Netewperwer a Skotlandê (SNP) xwest ku referandûmeke duyemîn bê lidarxistin.

Hewldan enîya serxwebûnxwazên Skotlandê çend sal paşê rastî midaxaleya hiqûqî hat. Hukumeta Skotlandê dixwest di sala 2023an de dengdana ji bo serxwebûnê li dar bixe. Lêbelê di sala 2022an de Dadgeha Bilind a Brîtanyayê bi biryara xwe ragihand ku Parlamentoya Skotlandê nikare bêyî erêkirina Westmînstêrê referandûmê li dar bixe. Ev biryar bû astengiyê qanûnî ya mezin li ser rêya projeya referandûmê.

Tevî van astengiyên hiqûqî jî, siyaseta Skotlandê hewldanên xwe yên ji bo referandûmê domand. SNPê di konferansa xwe ya Aberdeenê de stratejiyên nû diyar kirin û ragihand ku ew ê di hîlbijartinên pêş wekî referandûmeke de facto bi kar bînin. Dîsa di sala 2023an de di bin serokatîya Hemze Yûsif de li Skotlandê gaveke balkêş hate avêtin. Wezareta Serxwebûnê hate damezrandin û Jamie Hepburn jî wekî wezîr hat destnîşankirin.

## REWŞA SIYASÎ YA ÎROJ Û NÎQAŞÊN NÛ

Di hîlbijartinên giştî yên Brîtanyayê yên salên dawî de Partiya Karkeran piştî serkeftina li seranserê welêt, di Parlamentoya Skotlandê de jî hebûna xwe xurt kir. Ev jî zirarê da doza serxwebûnê ku ji aliyê SNPê ve pêşengîya wê tê kirin. Li aliyekî din, serokwezîrê nû yê Brîtanyayê Andy Burnham destnîşan kir ku ew li dijî banga referandûmeke nû ye. Burnham di heman demê de ji bo diyalogê bi serokwezîrê Skotlandê John Swinney re civîya.

Burnham di dewsa serxwebûnê de modela federalîzmê pêşniyaz dike da ku erk li ser hemû herêman bê dabeşkirin û hewcedarî bi hilweşandina Qraliyeta Yekbûyî nemîne. Li aliyê din, anketên dawî yên saziya Find Out Now (Tebaxa 2026an) nîşan didin ku piştî derxistina dengên nediyar, 52%yê skotlandiyan daxwaza welatekî serbixwe dikin.

Di asteke din de, Rêberê SNPê John Swinney, ligel serokên Plaid Cymru (Welatê Gal) û Sinn Féin (bakurê Irlandayê) bi hevdîtineke dîrokî de daxuyaniyeke hevpar îmze kirin da ku eniyeke antî-navendî li dijî hegemonyaya Westmînstêrê ava bikin.

## ENCAM Û DERSÊN JI TECRÛBEYA SKOTLANDÊ

Ezmûna Skotlandê nîşan dide ku otonomî pêvajoyeke zindîye kumeyla wê ya ber bi serxwebûnê ve li gorî şertûmercên welêt dikare bi awayekî domdar rojevê dîyar bike. Ji tecrûbeya Skotlandê ev encamên giring dikarin bê derxistin:

- 1. Sazîbûn û bingeha hiqûqî:** Otonomîya Skotlandê bi sîstema qanûnî, perwerde û saziyên xurt ên mayînde hatiye parastin. Saziya xurt, di demên tunebûna piraniya tevgera serwerîparêz di parlamentoyê de jî, garantiya ji bo parastina nasnameyê ye.
- 2. Giringiya azadiya darayî:** Xweseriya bê kontrola bacê û çavkanîyan her dem nîvco dimîne. Tecrûbeya Skotlandê nîşan dide ku berfirehbûna erkên siyasî rasterast bi xurtbûna otonomîya aborî ve girêdayî ye.
- 3. Têkoşîna meşrû û demokratîk:** SNP û tevgera Skotlandê heta niha bi rêya xebata parlamentoyê, peymanên fermî û referandûman doza serxwebûnê meşandin. Vê yekê daxwaza serweriyê di qada navneteweyî de rewşa dike.
- 4. Xetereya li ser ziman:** Têkoşîna siyasî divê bi parastina ziman re paralel bê meşandin. nêzîkatiya pragmatîk dibe ku sazîyan xurt bike lê heke siyaseta ziman neyê meşandin, zimanê resen dikare di bin zexta zimanê serdest de tune bibe.
- 5. Dînamîkên derve û guherîna mercan:** Geşedanên wekî Brexitê nîşan da ku biryarên dewleta navendî yên dûrî realîteya herêman xweser in, dikarin daxwazên veqetîne leztir bikin û balansên kevn hilweşînin.

Amadekar: Tîma Lêkolînê ya Infowelat